

Divê ez çi bizanim eger zarokê min bê derkirin?

Zaniyarên dê û bav/çavdêran

Derkirin çi ye?

Derkirin ew e dema ku mudûr û Rêveber, Serokatiya Perwerdehiyê ji xwendekarekî re dibêjin divê ji dibistanê derkeve û venegere. Derkirin mijarek e cidî ye. Berî ku biryara derkirinê bê dayîn, Divê hemû hewl bêne kirin ji bo piştgiriya zarokê we berî biryara derkirinê bê kirin.

Mûdîr dikarin xwendekaran ji ber du sedeman derbikin:

- Xwendevan reftarên ciddî yên bi fikar nîşan didin û planên birêvebirina reftarên wan bi ser neketin.
- Temenê xwendekar 17 salî û mezintir e û beşdarî dersan nebûye.

Berî ku mûdîr biryara derkirinê bide, dê bifikire ka xwendegehê çawa piştgirî daye fêrbûna zarokê we li gorî hewcedarî û paşreha wan.

Berî ku derkirin çêbibe, midûr dê bi we re têkiliyê dayne da ku we agahdar bike ku ew difikirin zarokê we derbikin. Ew ê li ser derkirina pêkan agahiyeke nivîskî bidin we û zarokê we, û we vedixwînin civînekê da ku sedeman bidin û biaxivin ka dê çi bibe heger ew zarok we derbikin. Hun dikarin [kesekî piştgirîyê](#) bi xwe re bînin civînekê. Kesê piştgirîyê dikare alîkarîya hestî ya jî pratîk bide we û/an jî bide zarokê we.

Piştî dîroka agahdariya nivîskî, heft rojên dibistanê dê ji bo we hebin da ku hûn bersivê bidin dibistanê ku sedemên divê zarokê we neyê derkirin. Midûr dê vê bersivê wekî beşekî pêvajoya biryargirtinê bikar bîne.

Ger zarokê min were derkirin dê çi bibe?

Midûr û Rêveber, Serokatiya Perwerdehiyê dê bi hev re biryarê bidin ka ew xwendekar were derxistin yan na. Di nav 24 saetan de ji biryara derkirina xwendekarekî, divê mudûr ji xwendekar û dêûbav yan lênerînvanê wan re bêje û Wezareta Perwerdehiyê ya NSW agahdar bike.

Ger zarokê we di bin 17 salî de be û ji ber reftarên xwe hatibin derkirin, divê midûr xwendegeheke nû yan cîhekî berdêl bibîne ku di nav 15 rojên xwendegehê de fêrbûna xwe bidomîne.

Ger zarokê we 17 salî yan mezintir be, divê hûn û zarokê we li vebijarkan bigerin da ku hînbûna wan bidomînin an jî derbasî kar bibin.

Ez dikarim çi agahîyan ji dibistanê bigirim?

Hun dikarin agahîyên zêdetir ji dibistanê bixwazin bê ka çi bûye û çima. Divê dibistan ji we re şîrove bike bê ka sedemên biyarên wan çi ni eger arîşeyeka we hebe divê sedema biyarên wan çi ne û dê çi çalakî yan jî çi bikin eger pirsgirêkeka we hebe.

Ez dikarim îtiraza derkirinê bikim?

Erê, heke hûn bawer dikin ku mûdîr û Rêveber, Serokatiya Perwerdehiyê biryarek nerast daye an prosedurên rast neşopandiye. [Çavkaniya îtirazê](#) binihêrin.

Agahdariya li ser [parêzvaniya ji bo zarokê](#) we heye, û herweha [Peymana Civata Xwendegeha](#) me ya ku awayên danûstandina bi xwendegehan re diyar dike.

Ez dê çawa gilî bikim?

Ger xemên we li ser derkirinê, biryarên hatine girtin yan piştgiriya hatî dayîn hebin, ji kerema xwe ji bo bêtir agahdarî [derbarê gilîkirinê](#) serî li malperê xînin.

Xizmeta wergerandina telefoni

Heke hûn dixwazin bi xwendegehê re têkiliyê daynin û ji bo Îngilîzî hewcedariya we bi alîkariyê heye, ji kerema xwe telefone xizmeta wergêriyê 131 450 bikin, ji wan re bêjin hûn çi zimanî diaxafin û ji operator bixwazin ku telefone xwendegehê bike. Operator dê wergêr li ser xetê peyda bike da ku alîkariya we bike. Ev xizmet bê pereye.